ÊZIMK

HEY, SER ÇAVAN

Salih Xazî

Pirraniya xelkê Kurdistanê şanaziyê bi dostîniya me û hêzên emerîkiyayê dibe, nexasime piştî ku wan, em ji dirindetirîn dektator rizgar kirîn. Dibe ku ev serbazên bo geryanê, yan bêhnvekirinê seredana bajarên Kurdistanê dikin, ew jî hest bi wê hevalbendiya di navbera me de bikin û her weku me gelek caran ji wan bi xwe guh lê bûyî ku, ew li Kurdistanê hest bi êmnahî û aramiyê dikin. Ez jorde ji dereckan hatim xwarê bo ser pira peyade, ya ku bazara Duhokê bi Girêbasê ve girêdide, du serbazên emerîkî li ser pirê rawestiyayî bûn û bi hûrî temaşeyî siroştê rûbarê Geliyê Duhokê dikirin, nemaze ew rewşa darûbarên li dorê rûbarî daye wî cihê dilnişîn. Li berahiya min, keçek esmer, ku çantê wê yê xwandingehê li milî bû, dimeşiya, dîsan du afretênê ji rengê wê li dûv min dihatin, min ageh jê bû demê ku afret tinê gehaye rasta herdu serbazan, yêkê ji wan gote keçkê:

-"Do you speak english?"

Keçkê patka xwe dayê û bersiva wan neda, demê ku ez gehiştîm semta wan, dîsan herduyan bi hev re gotin min:

- Hay!

Min jî bersiva wan da:

- Hay, ser serê xalê xwe!

Min pên xwe giran kirin heta ku herdu keçkên li pişt min gehiştîn ber singên wan, dîsan herduyan gotin:

- "Hay, Do you speak english?"

Dîsan çi bersiv ji layê keçkan ve nehate dan û pûte jî pê nehat kirin.

Mister, hun baş bizanin em miletê kurd bi giştî, hez ji we dikin. Em we bi dostên xwe yên herî baş dizanin, lê, hêvî dikin ku hûn herdu ji ber bersiva silava we ku ji layê keçkan nehatî dan, aciz nebin, ji ber ku heya niha rêjeyek êkcar zor ji keçkên me yên kurd, li jêr bandora dabûnerîtên kevn de mane,hekerna, ya ji min ve bersiv silava we hatiba dan gelek siroştî û normal bû.